**YA§A e.V.**

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

**YASA e.V.**
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org


# Danezana navnetewî ya mafên mirova

## Ji aliyê civîna giştî ya yekîtiya netewan di 10. cilêpêşî 1948 ê li ser hatî biriyardan[1]

**Wergêr: Ziya Brahîm**

[1] Cavkaniya navnetewî: Biryara 217 (III) Universal Declaration of Human Rights di: United Netions, Beneral Assemby, Official Records third Session (Part 1) Resolutions (Doc.A/810) rûpela 71 ê.

Ji ber ku danasîna rûmeta binecîkrî di hemu malbata mirovahiyê de û mafên wan ên wekhev, ew tev de dibin bingihê azadî, dadmendî û aştiyê di cîhanê de,
ji ber ku nenasîn û bêrûmetiya mavên mirova bûne serê wê yekê ku kiriyarên hovane pêk bên, yên ku hisyeta mirovahiyê bi kûrahî êşand, û ji ber ku pêkanîna cîhanekî, ku têde mirov, bê tirs û belengazî, azadiya gotinê û baweriyê parçek jê be, ev bibê weke asta herî bilind ya daxwazên mirov,
ji ber ku pêwîste, mafên mirova bi rêya serdariya yasayê bêne parastin, da ku mirov bêçare nebe û destdirêjiya serhildanê li dijî hovîtî û zordariyê bike,
ji ber ku pêwîst e, piştgiriya pêşketinên têkiliyên hevaltiyê dinavbera netewan de bê kirin,
ji ber ku gelên yekîtiya netewan esehî kirine û biryar dane di rêzbendê de baweriya xwe bi mafên mirova yên bingehîn, bi rûmet û giranbuhabûna mirovahiya kes û wekheviya jin û mêr, û piştgiriya pêşketina civakî û başkirina mercên jiyanê tev azadiyek berfireh,
ji ber ku dewletên endam soz dane, bi hevkarî tev yekîtiya netewan bicîanîna rêzgirtina giştî ya mafên mirova û azadiyên bingehîn,
ji ber ku têgihiştinek hevbeş ji bo van mafan û azadiyan heye, da ku pêkhatinek seranser bi van sozan bê kirin,
Civîna giştî vê danezana navnetewî ya mafên mirova tîne ziman
Wekî asta hevbeş ku ji aliyê hemu gelan û netewan tê xwestin, da ku pê her yek û hemu komîtên civakê vê danezanê timî di bîr de bihêlin û bizavê bikin bi rêka hînkirin û perwerdê rêzgirtina van mafan û azadiyan lê bê piştgirtin û pêkanîna gavên pêşketî di warê netewî û navnetewî de û bi rêka baweriya xwe ya giştî û rastiyane û pêkanîn li nik himwelatiyên cîhanê û dewletên endam, herwekî di herêmên dibin desthilatiya wê de.

**Benda 1 [Azadî, wekhevî, biratî]**
Hemu mirov di rûmet û mafan de, têne dinê bi awakî azad û wekhev.Ew xwedî hiş û bextin û gereke têkiliyên wan bihevre bibiratî bê.

**Benda 2 [Qedexekirina nijad-(regez)peristiyê]**
1. Her mirov xwediyê maf û azadiyên hatine ziman di vê danezanê de, bê ti cudahiyê weke nemaze li ser nijad, reng, nêr û mêtî, ziman, ol, baweriyên siyasî yan yê din, rayên netewî yan civakî, maldarî, zayîn yan her rewşeke din.
2. Her wiha nabe tu cudahî li ser bingihê rewşa siyasî, yasayî an navnetewî yê welat an herêmê, yê ku ew kes jê ye, bê ku ev bi wê yekê ve girêdayî bê, ka ev welat yan herêm serbixwe ye yan dibin wisayetê de ye yan bê autonomiye (xwerêvebirî) yan jê serweriya wê girêday ye bi astengiyekî bê kirin.

**Benda 3 [Mafê jiyanê û azadiyê]**
Her mirov mafê jiyan, azadî û parastina kesatiya xwe heye.

**Benda 4 [Qedexekirina koletî û bazirganiya koleya]**
Nabe tu kes dibin koletî yan benîtiyê de bê girtin; koletî û bazerganiya koleya bi hemu şêweyê xwe qedexeye.

**Benda 5 [Qedexekirina êşkencê]**
Nabe tu kes bikeve dibin êşkencê yan destdirêjî û cezayên hovane, nemirovane yan bê rûmetî lê bê birîn.

**Benda 6 [Piştrastkirina kesayetiya yasayî]**
Her mirov li her derî maf heye, ku kesayetiya wî ya yasayî bê erêkirin.

**Benda 7 [Wekhevî li pêşiya yasayê]**

Hemu mirov li pêşiya yasayê wek hevin û bê cudahî maf hene ku bêne parastin bi rêka yasayê. Hemyan maf heye ku wek hev li dijî hemî kiriyarên newekhev, yên ku ji rêya vê danezanê derdikevin û li dijî her pîjkdanekî bero têkiliyê cuda bi vî awayî bêne parastin.

**Benda 8 [Mafê parastina yasayî]**
Her mirov mafê wî ji bona parastink yasayî, ya bi bandor, li pêşiya dadgehên bi erik,di hundurê dewletêde û li dijî hemu kiriyarên ku destûrê yan yasayê binpêlê dikin derkevê heye.

**Benda 9 [Parastin li himberî girtin û dûrkirinê]**
Nabe tu kes bê dadî bê girtin, zindankirin yan dûrkirin ji welatê xwe.

**Benda 10 [Mafê guhdanek yasayî]**
Her mirov mafekê wî yê misewger heye ji bo ku doza wî li pêşiya dadgehek xwedî erik, vekirî, serbixwe û bê milmilane, ku li ser mafê wî û erkên wî yan li ser suncên gunehkariyê bikare biryarbide.

**Benda 11 [Quis censetur innocens; nulla poena sine lege]**
1. Her mirovek ku bête suncdarkirin ji bona kiriyarekî, ew tête dîtin wekî bêguneh, ta ku suncê wî di dadgeriyek vekirî de, ku têde hemî pêwîstiyên wî yê parastinê hatibin bicîkirin, gurî yasayê bê xuyanîkirin.
2. Tu kes nayê suncdarkirin ji bona kirin yan nekirina kiriyarekî, ku di wî wextê kirin de, gorî yasa netewî yan navnetewî nedihat suncdarkirin. Herwiha nabê ku bê tewanbarkirin bi cizakî girantir ji yê ku diwextê kiriyarê de dihat bi karanîn.

**Benda 12 [Azadiya jiyana teybet]**
Tu kes bi zordarî nabe di jiyana wî ya taybet de bê êrîşkirin, malbat, mal, danûsitandinê wî de yan êrîşên li ser namûsa wî yan li ser kardestiya (pîşeya) wî. Her mirov li dijî van êrîş û têkiliyên xirab, maf heye ji bona parastinek yasayî.

**Benda 13 [Azadiya gerê û malbarkirinê]**
1. Her mirov mafê wî ji bona ger û hilbijartina cihrûniştina xwe di hundurê welat de heye.
2. Her mirov maf heye, her welat, di nav de yê xwejî, berde û carek din li welatê xwe vegere.

**Benda 14 [Mafê penaberiyê]**
1. Her mirov maf heye, ji bo zordariyê, li welatên dine penaber bibê û vî mafî bidestxîne.
2. Ev maf nayê bidestxistin heger bazdana wî ji bûna kiriyarên nesiyasî bin yan li dijî armanc û daxwazên yekîtiya netewan be.

**Benda 15 [Mafê nasnameyê]**
1. Her mirov mafê wî yê ji bo nasnameyekî heye.
2. Nabe nasnameya tu kesî jê bê kişandin bi awakî zordarî, an mafê wî bê tunekirin ji bona guhertina nasnameya wî.

**Benda 16 [Azadiya şîtkirinê (jinanînê), parastina malbatê]**
1. Jin û mêrên gihayîn temenê şîtkirinê xwedî mafin bê astengiyên wekî nijadê, nasnama welat yan Olê, şîta xwe girêdin û malbatekî avabikin. Di dema şîtkirinê de, di wextê berdewamiya wê de û gava bê hilweşandin ewan weyî hev maf hene.
2. şîtkirin tenê dikare bê girêdan li ser binghek azad û yekgirtina xwesteka jin û merê hev yê pêşerojê.
3. Malbat yekgirtineke siruştî û bingehîne, ya civakê û ewê mafê parastinê heye ji aliyê civak û dewletê.

**Benda 17 [Parastina maldariyê (milk)]**
1. Her mirov mafê wî heye, bi tena sere xwe yan tev civakê bibê xwedî mal.
2. Nabe maldariya tu kesî bi zordarî jê bê sitandin.

**Benda 18 [Azadiya bext û olê]**
Her mirov mafê wî yê azad yê ramanê, bext û olê heye; ev maf digihêjê azadiya guhertina ol û bîr û baweriyê. Her wiha azadiya ol û bîr û baweriya xwe bitena serê xwe yan tev civakê, bi awakê vekirî yan taybet, bi rêya hînbînê, pêkanûnê û bicîanîna xudaperistiyê bide xuyanîkirin.

**Benda 19 [Azadiya ramanê û nûçegihandinê]**
Her mirov mafê wî heye bi azadî ramanê xwe bînê ziman, ev maf dighêjê azadiyê, bawerî bi ramanan bê astengî û têkilî, û vekulan û bidesxistina nûçeyan û pêşniyara lêgerandinê, girtin û belavkirinê bi hemu alavên xwe yê ser-rast bê girêdan bi ti sînoran.

**Benda 20 [Azadiya komcivîn û komelayetî]**
1. Her mirov mafê wî heye bi azadî bicive û komeleyan ava bike ji bona armancên aştiyane.
2. Nabe tu kes bê kotekkirin ji bo endametiya yekgirtinekî.

**Benda 21 [Hilbijartinê giştiyane û wekhev]**
1. Her mirov mafê wî heye ku tevlî rêvebiriya giştî ya welatê xwe bibe, bi awakê yekser yan bi rêka
nûnerên azad hatîn hilbijartin.
2. Her mirov mafê wî heye, di bin yek mercan de ku karûbarên giştî yê welatê xwe bidestxe.
3. Daxwaza gel ewe ku dibe serkanî û bingih ji bo serdariya desthilatê ya giştî; ev vîna he dive bête diyarkirin bi rêka hilbijarinê wextane de û bê sixte, bi awake giştiyane û wekhev, ev hilbijartin divê dengdan tê de nependî be yan di asteke wekhev û azade, ev rêveçûna hilbijartina bê pêkanîn.

**Benda 22 [Debariya civakî]**
Her mirov wekî endamê civakê maf heye ji bo debariya civakî; ewî mafê serkeftina aborî, civakî û çandî yên pêwîst heye, ku birêka bizavên netewî û hevkariya navnetewî, li ber berçavgirtinê her welatek û maldarî û rêk û pêka wê, di bin berjewendiya rûmet û pêşkeftina azad ya kesayetiya wî.

**Benda 23 [Mafê kar û mafdesta wekhev, azadiya hevbendiyê]**
1. Her mirov mafê wî heye ji bo kar, azadiya kardestiyê (pîşe yê)û di bin mercên dadî û dilpêxweş de bixebite herwekî mafê wî li dijî bêkariyê.
2. Hemu mirov bê cudahî mafê wan ji bo mafdestek wekhev ji bo karek wekhev heye.
3. Her mirov ku kardike, mafê wî ji bo mafdestek bi dad û dilpêxweş heye ku ji wî û malbata wî re jiyanek gorî rûmeta mirov pêk bîne û heger pêwîst bê gereke bi hin alavên din yê parastina civakî bê seranserkirin.
4. Her mirov maf heye, ji bo parastina berjewendiyê xwe, yekîtiyakardesta ava bike û bibe endam.

**Benda 24 [Bihinvedan û wextê vala]**
Her mirov mafê wî, ji bo bihinvedanê û wextê vala heye, her weku ji bo demkariya bi sînor û semiyan û ji bo bihinvedanek wextane û bi peredan.

**Benda 25 [Çavdêriya civakî]**
1. Her mirov maf ji bo jîndariyekî, ku têde tendurustî û xweşiya wî û malbata wî bê parastin heye, nemaze xwarin û verxwarin, cil, xanî, çavlêderiya pijîşkî û pêguhdanên civakî yên pêwîst; ewî maf heye ji bo ewlkariyê di çaxê bêkariyê, nexweşiyê, şilûşehtiyê, mêrobînê yan jinobînê, kalbînê yan destberdana alavên pêxweyîkirinê derveyî xwesteka wî.
2. Dê û zarok mafê wan ji bo piştgirtinek teybet heye. Hemu zarok, bêjî û nebêjî, xwedî parastinek

civakî wekhev in.

**Benda 26 [Çavdêriya kulturî, mafê dê-bava ]**

1. Her mirov xwedî mafê hînkirinê ye. Xwedin gereke ji kêmanî ve di qunaxên xwe yê dibistanê yê seratayî û navendî bê pere bin. Xwendina sertayî bivê-nevêye. Xwendina beşan û hostayiyê dive bi giştî vekirî be; xwendina bilind divê ji her kesî re gorî jêhatbûn û lebatê vekirî be.

2. Divê armanca perwerde û avakirina kesayetiya mirov û xurtkirina rêzgirtina mafê mirov û azadiyên bigehîn be. Divê ew têgihiştin, lêborîn û dostahiya di navbera hemu netewan û hemu nijadan, yan kom-ol an de piştgir be û xebata yekîtiya netewan ji bo parastina aştiyê bi hêz bike.

3. Di pêşiya herkesî de dê û bav xwedî mafin, biryarê di derbarê awayê perweda zarokê xwe de bidin.

**Benda 27 [Azadiya jiyana kulturî]**

1. Her mirov xwedî mafe, pişikdariyê bi azadî di jiyana giştî ya kulturî de bike, dilxweşiyê bi hunerê bike û têkilî pêşketina zanyarî bibe û ji encamê wê mifayê wergire.

2. Her mirov xwedî mafê, ku berjewendiyên wî yê madî û manawî_bêne parastin, yên wekî encam ji xebata wî ya zanarî, toreyî û hunerî ve têne holê.

**Benda 28 [Civakek dadmend û rêzbendek navnetewî]**

Her mirov mafê wî heye, ku xwedî rêzbendek civakî û navnetewî be, ku tê de ev maf û azadiyên vê danezanê bi tevahî bêne pêkanîn.

**Benda 29 [Erkên bingihîn]**

1. Her mirov erkin hene li himber civakê, ku tê de tenha bikarîbe kesayetiya xwe pêş ve bixe, bi azadî û seranser.

2. Her mirov dikaranîna maf û azadiyên xwede tenê girêdaye bi wan sînorê ku yasayê danîne wekî armanc, da ku nasandin û rêzgirtina maf û azadiyên kesên din bê destxistin û xwestekê mafdar yê moral û rêdariya giştî û xêrxwaziya tevahî di civakeke dimokrat de bê têrêkirin.

3. Nabe bi ti awayî maf û azadî li dijî armanc û yasayên bingehîn yê yekîtiya netewan bên bikaranîn.

**Benda 30 [Awayê şirovekirinê]**

Di vê danezanê de tu bingeh nîne ku mafê şîroveka wisa bê kirin, ji wê Dewletek, komek yan kesek, mafekî bide xwe ku ew kiryarekî bike yan lebatekî li ber çav bigre ku armanca wan tinekirina maf û azadiyê di vê danezanê de hatine bicîkirin be.

* Ev danezan ji aliyê Ziya Birahîm , endamê Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasa yî YASA e.V. ve hatiye wergerandin ji zimanê elmanî, cilêpêşî. 2011.